WERZIŞ

SERETAYÎ

2

2019/2020

AMADEKAR

Ev pirtûk ji aliyê Komîteya Werzişê ve hatiye amadekirin.

LÊVEGER

- Komîteya Şopandinê
- Komîteya Fotoşopê
- Komîteya Redekteyê

Ev pirtûk ji aliyê Saziya Minhacan ve, wek pirtûka wanedayînê, ji bo dibistanan hatiye pejirandin.

NAVEROK

ARMANCÊN FÊRBÛNÊ 7

BEŞA YEKEM 13

RAHÊNANÊN TEVGERÎ 14

Çalakî 18

HÎNBÛNA LÎSTIKAN...22

SINC Û SÛDÊN WERZIŞÊ 24

RAHÊNANÊN BEJINZIRAVIYÊ...27

BEŞA DUYEM 29

RAHÊNANÊN TEVGERÎ 30

ÇALAKÎ..34

HÎNBÛNA LÎSTIKAN...38

SINC Û SÛDÊN WERZIŞÊ 40

RAHÊNANÊN BEJINZIRAVIYÊ...43

BEŞA SÊYEM 45

RAHÊNANÊN TEVGERÎ 46

ÇALAKÎ..49

HÎNBÛNA LÎSTIKAN...53

SINC Û SÛDÊN WERZIŞÊ 55

RAHÊNANÊN BEJINZIRAVIYÊ...59

BEŞA ÇAREM 61

RAHÊNANÊN TEVGERÎ 62

ÇALAKÎ..67

HÎNBÛNA LÎSTIKAN...71

SINC Û SÛDÊN WERZIŞÊ 73

RAHÊNANÊN BEJINZIRAVIYÊ...76

BEŞA PÊNCEM 79

RAHÊNANÊN TEVGERÎ 80

ÇALAKÎ..84

HÎNBÛNA LÎSTIKAN...89

SINC Û SÛDÊN WERZIŞÊ 91
RAHÊNANÊN BEJINZIRAVIYÊ... 94
BELAVKIRINA WANEYAN LI SER SALA XWENDINÊ............... 96

ARMANCÊN FÊRBÛNÊ

RAHÊNANÊN TEVGERÎ

1- Germkirin li qada dibistanê:

Pêwîst e xwendekar bi awayekî rêxistinkirî û saxlem ji polê dakevin qada dibistanê. Bi awayekî guncaw li gorî rêbaza germkirinê, bên belavkirin. Di vê pêvajoyê de germkirin bi sê cureyan tê kirin: Germkirina bi lîstikan, germkirina bi amûran û germkirina kilasîkî. Armanca germkirinê ew e ku xwendekar ji aliyê laş û derûniyê ve, bê amadekirin. Ew jî bi rêya gihandina hemû pergalên laşê wê/î yên lebatî, jiyangîr û tevgerî ji bo rewşeke guncaw ku egerên derbxwarinê di dema pêkanîna pêngavên waneyê de, kêm bike.

2- Rahênan:

Li qada dibistanê piştî ku armancên germkirinê tên bidestxistin, rahênan pêk tên. Xwendekar bi awayekî guncaw ji bo pêkanîna rahênanan, tên belavkirin. Armanca rahênanan, amadekirina laşekî saxlem û avakirina gewdeyekî şeng e. Pêwîst e rahênan li gorî temenên xwendekaran, guncaw bin.

- **Cureyên Rahênanan:**

a. Rahênanên tevgerî:

Bi rêya lasakirina tevgerên mamoste yên ku tên hejmartin, xwendekar rahênanan bi awayekî rast, pêk tînin.

Ji bo her aliyekî laş, carekê rahênan pêk tê. Rahênan ji bo her aliyekî du hejmaran digire. Her carek pêkanîna rahênanê ji bo her du aliyên laş çar hejmaran digire.

Rahênan heşt caran pêk tên, ji ber ku ji bo pêkanîna rahênanan ev hejmar a guncaw e. Rahênan, hemû beşên laş digire nava xwe. Weke: pê, çok, noq, dest û stû. Her wiha rahênên ji bo bihêzkirin û hevsengiyê jî pê re tên kirin.

b. Rahênanên cotî:

Rahênan di navbera du xwendekarên ku bi awa û teşeyên cuda rawestiyane, pêk tên. Her du xwendekar rahênanan bi heman tevgeran pêk tînin. Armanca rahênanên cotî ew e ku xwendekar ji bo pêkanîna tevgerên rahênanan bi awayekî rast bên amadekirin, her wiha hevaltî û wekhevî di navbera wan de xurt bibe.

c. Rahênanên hemahengiya sinerî ji masûlkeyan re:

Rahênanên vî cureyî livandina du beşên laş bi hev re bi awayekî herikbar û lihevhatî digire nava xwe. Armanca vê rahênanê ew e ku berjengên hestiyarî û sinerî yên laş zêde bike û bertekên tevgerî ji masûlkeyan re xurt bike.

3- Lîstik û pêşbirk:

Di pêkanîna gavên lîstik û pêşbirkan de, xwendekar bi awayekî guncaw, tên belavkirin.

Armanca lîstik û pêşbirkan ew e ku xwendekar kêfxweş bibin, berjengên xwegirtina laş bên qezenckirin û bicihanîna tevgerê bi rêya pêkanîna gavên lîstik û pêşbirkan were bipêşxistin.

4- Rahênanên aramkirinê:

Ev rahênan, tevgerên mîna meş, hêlankirin û tevgerên nerm bi bêhindanên dirêj, digire nava xwe. Armanca van tevgeran, çandina aramiyê di laş de û gihiştina rewşa xwezayî ye.

5- Çalakiyên bidawîkirina waneyê:

Çalakiyeke serbest e ku xwendekar di dawiya waneyê de pê radibin. Armanc jê diyarkirina hezkirina wan ji werzişê re û zêdekirina amadekirinê li cem wan e, da ku werzişê birêkûpêk bikin.

Bejinziravî

1- Di waneya bejinziraviyê de germkirin:

Germkirin di waneyê de xwedîtaybetiyeke mezin e. Ji ber ku pêwîst e di germkirinê de pergalên laşê xwendekar ên jiyangîr û lebatî, baş werin amadekirin. Her wiha pergalên tevgerî yên mîna masûlke û gihikan bi armanca zêdekirina nermbûna wan, baş werin germkirin.

2- Rahênanên bejinziraviyê:

Rahênanên bejinziraviyê di hundirê poleke raxistî de, pêk tên. Armanca wan jî pêşxistin û zêdekirina nermbûn û xurtkirinê di pergalên tevgerî yên laşê xwendekaran de ye. Bi vê yekê jî xwendekar berjengên şengbûn û xwegirtinê qezenc dikin. Ev yek bandoreke erênî li ser derûniya xwendekaran dike.

3- Çalakiyên bidawîkirina waneyê:

Çalakiyeke serbest e ku xwendekar di dawiya waneyê de, pêk tînin. Armanc jê zêdekirina amadekirina wan, diyarkirina hezkirinê û birêkûpêkirina wan ji werzişê re ye.

Sinc û sûdên werzişê

1- Germkirina laş di hundirê polê de:

Ev cureyê germkirinê ji ber ku di rojên sar ên werzê zivistanê de em nikarin derkevin qadê, pêk tê. Ev cure di hundirê polê de û di destpêka waneyê de, cih digire û tevgerên wê hêsan û bilez in. Armanc jê çalakkirina laşê xwendekaran (pê, çok, noq, dest û stû) û amadekirina derûniya wan ji bo gavên waneyê ye.

2- Sûdên werzişê ji bo laşê me:

Ev beş, sûdên werzişê yên li ser pergalên laşê me digire nava xwe, her wiha amadekirin û hezkirina werzişê li cem xwendekaran, peyda dike.

3- Tîmarên baş ji bo laşên me:

Ev beş, tîmarên herî bisûd ên ku alîkariyê didin pergalên laşê me û bi saxlemî ava dikin, digire nava xwe. Armanc ew e ku xwendekar sûdên wan nas bikin.

4- Tevger û sincên werzişvan:

Ev beş, tevger û berjengên guncaw digire nava xwe. Pêwîst e xwendekar di jiyana xwe ya civakî de û di dema werzişkirinê de, bi hevalên xwe re pêk bîne.

5- Lîstikên hundirê polê:

Ev beş, lîstikên ku di hundirê polê de tên lîstin, digire nava xwe. Armanc jê, çandina kêf û şadiyê di dilê xwendekaran de û pêşxistina hêza hestyarî û hişmendiyê li cem wan e.

BEŞA YEKEM

Waneya 1'ê

Rahênanên Tevgerî

Waneya 2'yan

Çalakî

Waneya 3'yan

Hînbûna Lîstikan

Waneya 4'an

Sinc û Sûdên Werzişê

Waneya 5'an

Rahênanên Bejinziraviyê

Wane (1)

RAHÊNANÊN TEVGERÎ

5 xulek

- **Piştî daketina qadê bi awayekî disiplînkirî:**

Rahênanên tevgerî: 20 xulek

Ka em rahênanên li jêr bi mamoste re pêk bînin:

✿ Em di cihê xwe de bimeşin.

✿ Em di cihê xwe de, xwe çind bikin.

✿ Em çoka xwe bi jor de bilind bikin.

✿ Bi çindkirina vekirî re, em destên xwe li kêlekê bilind bikin.

✿ Em lingê xwe bi pêş de bavêjin.

Lîstik: 15 xulek

✿ Lîstika berhevkirina gogên biçûk di zembîlê de.

Şîrovekirin: Xwendekar li ser du rêzan tên rêzkirin û li pêşiya her rêzekê gogên biçûk tên belavkirin. Lîstik bi fîkandina mamoste re dest pê dike. Xwendekara/ê yekem ji her rêzekê du gogan berhev dike, wan ber bi zembîlê ve dibe û piştre xwendekara/ê li pey wî derdikeve.

Çalakiya bidawîkirina waneyê 5 xulek

Wane (2)

Çalakî

Germkirina bi rêya lîstikê: 10 xulek

★ Lîstika rengan:

Şîrovekirin: Lîstikgehek li gorî hejmara xwendekaran tê nîşankirin. Di hundirê lîstikgehê de amûrên bi rengên cuda tên belavkirin. Lîstik bi bangkirina mamoste ji navê rengekî re, dest pê dike. Xwendekar xwe li rengê nîşankirî digirin û li dora wî kom dibin. Her carekê, reng tê guhertin.

Lasakirin: 15 xulek

★ Em weke şelpiyê qeyikê, destê xwe bigerînin.

★ Weke daran, em gewdeyê xwe bi kêlekê de bitewînin.

★ Weke keroşkê em xwe bi pêş de çind bikin.



★ Weke ajokar em li ser kursiyê rûnin û tevgerên wî lasa bikin.

Lîstik: Pêşvebirina pimpimokan. **15 xulek**

★ **Şîrovekirin:** Xwendekar li du rêzên rastênhev tên belavkirin. Di her du rêzan de hejmar û taybetiyên zayendî (keç û kur bi hev re) li ber çavan, tên girtin. Li pêşiya her rêzekê kovikek tê danîn. Lîstik bi fîkandina mamoste re dest pê dike. Xwendekarek ji her rêzekê pimpimoka xwe bi pêş ve dibe, li kovikê dizivire, vedigere û pimpimokê dide hevalê pey xwe. Lîstik bi vî awayî berdewam dike.

Çalakiya bidawîkirina Waneyê **5 xulek**

Wane (3)

HÎNBÛNA LÎSTIKAN

Germkirina laş: 5 xulek

Bi armanca amadekirin û germkirina laşê me, em hin rahênanên tevgerî mîna yên di wêneyên li jêr de, pêk bînin.

Lîstika goga pêyan (fûtbol): 30 xulek

Ev lîstik komî ye û di navbera du tîmên ku hejmara wan heman e, tê lîstin. Her tîmek golekî wan heye. Gog bi lingan tê lîstin, tenê golar dikarin bi destên xwe gogê bigirin.

Em bi hev re goga pêyan bilîzin.



Çalakiya bidawîkirina waneyê 5 xulek

Wane (4)

SINC Û SÛDÊN WERZIŞÊ

☆ Germkirin di hundirê polê de: 5 xulek

1- Vekirin û girtina tiliyan.

2- Bi kêlekê de tewandina gewde.

3- Meşa hêdî di cihê xwe de.

Sûdên werzişê: 5 xulek

☆ Dema em werzişê dikin, hestiyên me saxlem û xurt dibin.

Tîmarên baş ji werzişvan re: 5 xulek

☆ Pêwîst e em şîr û hêkan bixwin, ji ber ku hestiyên me ava, xurt û saxlem dikin.

Sincên werzişvan: 5 xulek

☆ Dema ku em bi hevalên xwe re dilîzin, pêwîst e em alîkariyê bidin hev û ji hev hez bikin.

Lîstika kêfxweşî û xemgîniyê: 15 xulek

☆ Em li rewşên ku mamoste dibêje baldar bin û wêneyê guncaw bilind bikin.

Mamoste çîrokekê ji xwendekaran re dibêje, di naveroka çîrokê de rewşên kêfxweşî û xemgîniyê derbas dibin. Xwendekar li gorî rewşên derbasbûyî wêneyên guncaw (xemgînî, kêfxweşî) b0ilind dikin.

xulek 5 **êeydawîkirina wanbiÇalakiya**

Wane (5)

RAHÊNANÊN BEJINZIRAVIYÊ

- Germkirin: **5 xulek**

Meşa hêdî → Beza hêdî → Beza bilez.

- Tevgerên vezilandinê: **5 xulek**

Berî ku em dest bi tevgerên bejinziraviyê bikin, pêwîst e em hin rahênanên vezilandinê, ji bo nermkirina rehên masûlkeyan û pêgirekên gihikan, pêk bînin.

Em li wêneyên li jêr binêrin û mîna wan, tev bigerin. Tevger bi alîkariya mamoste û bi awayekî tekane, pêk tên. **30 xulek**

1

2



3

4

Çalakiya bidawîkirina waneyê **5 xulek**

BEŞA DUYEM

Waneya 1'ê
Rahênanên Tevgerî
Waneya 3'yan
Hînbûna
Lîstikan
Waneya 2'yan
Çalakî
Waneya 5'an
Rahênanên
Bejinziraviyê
Waneya 4'an
Sinc û Sûdên Werzişê

Wane (1)

RAHÊNANÊN TEVGERÎ

5 xulek

- **Piştî daketina qadê bi awayekî disiplînkirî:**

✷ Rahênanên tevgerî: 20 xulek

Ka em rahênanên li jêr bi mamoste re pêk bînin.

✷ Em stûyê xwe bi guhertinê bi kêlekan de bitewînin.

✷ Em destên xwe bigerînin.

✷ Em gewdeyê xwe bi guhertinê bi kêlekan de bizivirînin.

✷ Em lingê xwe bi pêş de bikişînin.

✷ Em li ser lingekî rawestin.

✷ Lîstik: 15 xulek

✷ Lîstika pêlikan:

Şîrovekirin: Xwendekar li du rêzên rastênhev, tên belavkirin. Li pêşiya her rêzekê du kovik tên danîn; kovikek xêza destpêkê, ya din xêza bidawîkirinê, nîşan dikin. Lîstik bi fîkandina mamoste re, dest pê dike. Xwendekara/ê yekem ji her rêzekê, dest bi meşa li ser pêlikan dike. Her cara ku pêlik li pey wî dimîne, tîne pêşiya xwe. Bi vî awayî bêyî ku lingê wê/î bighêje erdê, bi pêş ve diçe. Di dema pêşveçûnê de pêwîst e li ser pêlikan bighêje xêza dawiyê.

Çalakiya bidawîkirina waneyê 5 xulek

Wane (2)

ÇALAKÎ

Germkirina bi rêya lîstikê: 10 xulek

♛ Lîstika berevajî nîşankirinê.

Şîrovekirin: Lîstik di hundirê lîstikgeheke nîşankirî de, tê lîstin. Xwendekar di hundirê lîstikgehê de bi serbestî belav dibin. Lîstik, bi fîkandina mamoste û nîşankirina wê/î ji aliyekî re, dest pê dike. Xwendekar bervajî aliyê nîşankirî, tev digerin. Di nava lîstikê de, alî tên guhertin.

Lasakirin: 15 xulek

♕ Em weke tîrê saetê gewdeyê xwe bigerînin.



♕ Em weke çûk, xwe bi pêş de çind bikin.

♕ Em çokên xwe mîna cotkar ber bi jêr ve bitewînin.



♕ Em xwe li ser şehê pê, bilind bikin û mîna kesekî ku bi destan mêweyên darê jê bike, tev bigerin.



Lîstik: 15 xulek

♛ Lîstika kişandina werîs.

Şîrovekirin: Xwendekar li ser du tîmên ku ji aliyê hejmar, teybetiyên zayindî (keç û kur bi hev re) û hêzê ve wekhev in, tên belavkirin. Endamên her tîmekê bi rêzê li hemberî endamên tîma din radiwestin. Li her aliyekî, werîs tê bicihkirin û xêzek li ser erdê di rasta nîvê werîs de, tê çêkirin. Lîstik bi fîkandina mamoste re, dest pê dike. Her tîm hewl dide tîma din ber bi xwe ve bikşîne û wê ji xêza nîvî derbasî beşa xwe bike.

Çalakiya bidawîkirina waneyê 5 xulek

Wane (3)

HÎNBÛNA LÎSTIKAN

Germkirina laş: 5 xulek

Bi armanca amadekirin û germkirina laşê xwe, em hin rahênanên tevgerî mîna yên di wêneyên li jêr de, pêk bînin.

Lîstika goga Firokê: 30 xulek

Lîstikeke komî ye û di navbera du tîmên ku bi heman hejmarê ne, tê lîstin. Di navbera wan tîman de, toreke ji erdê bilind ku lîstikgehê dike du beş, heye. Tîma ku gogê di ser torê re derbasî beşê tîma din bike û gog li erdê bikeve, xalekê bi dest dixe.

Em bi hev re bi goga firokê bilîzin.



Çalakiya bidawîkirina waneyê 5 xulek

Wane (4)

SINC Û SÛDÊN WERZIŞÊ

Germkirina di hundirê polê de: 5 xulek

1- Anîna destan li pêş.
2- Firikandina destan bi hev ve.
3- Meşa di cih de.
4- Bi tevahî tewndina çokê.

Sûdên werzişê: 5 xulek

✱ Werziş, masûlkeyan xurt dike û laşê me saxlem dike.

Tîmarên baş ji werzişvanan re: 5 xulek

✻ Goştê masiyan**,** tîmareke baş e; masûlkeyên me xurt dike û laşê me saxlem û ava dike.

Sincên werzişvan: 5 xulek

✻ Em li paqijiya dibistana xwe, baldar bin.

Lîstika lebatên rûyê mirov: 15 xulek

✻ **Şîrovekirin:** Lîstik di hundirê polê de û li ser depê, tê lîstin. Her carê xwendekarek derdikeve ser depê û çavgirtî rûyekî xêz dike. Hewl dide ku çav, poz, guh û dev di cihê wan de xêz bike.

Çalakiya bidawîkirina waneyê 5 xulek

Wane (5)

RAHÊNANÊN BEJINZIRAVIYÊ

- Germkirin: **5 xulek**

Meşa hêdî → Beza hêdî → Beza bilez.

- Tevgerên vezilandinê: **5 xulek**

Berî ku em dest bi tevgerên bejinziraviyê bikin, pêwîst e em hin rahênanên vezilandinê ji bo nermkirina rehên masûlkeyan û pêgirekên gihikan, pêk bînin.

✻ Em li wêneyên li jêr binêrin û mîna wan tev bigerin. Tevger bi alîkariya mamoste û bi awayekî tekane, pêk tên. **30 xulek**

1

2

3

4

Çalakiya bidawîkirina waneyê **5 xulek**

BEŞA SÊYEM
WANEYA 1'ê
Rahênanên Tevgerî
WANEYA 2'yan
Çalakî
WANEYA 3'yan
Hînbûna Lîstikan
WANEYA 4'an
Sinc û Sûdên Werzişê
WANEYA 5'an
Rahênanên Bejinzirazviyê

Wane (1)

RAHÊNANÊN TEVGERÎ

5 xulek

- **Piştî daketina qadê bi awayekî disiplînkirî:**

Rahênanên tevgrî: 20 xulek

Ka em rahênanên li jêr bi mamoste re pêk bînin:

❀ Ka em di cihê xwe de li ser şehê pê, bimeşin.

❀ Em xwe bi kêlekan de çind bikin.

❀ Em bi çindkirinê re berê xwe bizivirînin.

❀ Em lingên xwe dirêjî kêlekan bikin û pê re li çepkan bixin.

❀ Lîstik: 15 xulek

❀ Lîstika gihandina rasparteyê.

Şîrovekirin: Xwendekar di rêzeke rast û hevgirtî de cihê xwe digirin. Lîstik bi derketina xwendekara/ê yekem ji rêzê û rahiştina raspartê bi xwe re, dest pê dike. Li pêşiya xwendekar bend û astengên cuda hene. Ji bo xwendekar raspartê bighîne hevalê pey xwe, pêwîst e wan astengiyan derbas bike. Lîstik bi vî awayî heya xwendekar bi giştî pêk bînin, berdewam dike.

❀ Çalakiya bidawîkirina waneyê ❀ 5 xulek

Wane (2)

ÇALAKÎ

Germkirin: 10 xulek

* Em li ser van amûran tevgerê bikin û laşê xwe germ bikin.

1

2

3

4

5

Lasakirin: 15 xulek

* Em destên xwe mîna pêlêkerkên (dewase) biskilêtê bigerînin.



* Em weke ajokarê terempêlê gewdeyê xwe bitewînin.

✻ Em weke beqê xwe çind bikin.

✻ Em li ser lingekî rawestin û mîna baskên firokeyê destên xwe bi kêlekan de, bilind bikin.



Lîstik: 15 xulek

* Lîstika kortikê.

Şîrovekirin: Xwendekar li ser du rêzên rastênhev tên belavkirin. Kovikek, xêza destpêkirinê nîşan dike û bi dûrbûneke guncaw cihê gogê yan kortika wê tê nîşankirin. Lîstik bi fîkandina mamoste re dest pê dike. Xwendekarek ji her rêzekê goga xwe bi rêya darekî ji text an jî ji bilastîkekê (ji bo ku gogê bixe hundirê kortikê) ber bi kortikê ve dibe.

Çalakiya bidawîkirina waneyê 5 xulek

Wane (3)

HÎNBÛNA LÎSTIKAN

1- Germkirina laş: 5 xulek

Bi armanca amadekirin û germkirina laş, em hin rahênanên tevgerî mîna yên di wêneyên li jêr de pêk bînin.

2- Lîstika goga mêzeyê (pînpong): 30 xulek

Lîstikeke tekane ye. Gog di navbera her du lîstikvanan de li ser mêzeyê diçe û tê. Tor, mêzeyê dike du beş.

Lîstikvana/ê ku gogê li beşa mêzeyê ya pêşberî xwe bixe, bêyî ku vegere beşa wê/î, xalekê bi dest dixe.

Em bi hev re goga mêzeyê bilîzin.

Çalakiya bidawîkirina waneyê 5 xulek

Wane (4)

SINC Û SÛDÊN WERZIŞÊ

☆ Germkirina di hundirê polê de: 5 xulek

1- Bilindkirina destan ber bi jor ve.
2- Zivirandina gewde ber bi kêlekê ve.
3- Çindkirina di cih de.

Sûdên werzişê: 5 xulek

☆ Werziş, berevaniya laşê me li hember nexweşiyan xurt dike.

Tîmarên baş ji werzişvanan re: 5 xulek

☆ Av laşê me pir çalak dike.

* **Têbînî:** Pêwîst e em di dema lîstinê de û piştre jî bi demeke kurt, gelek avê venexwin.

Sincên werzişvan: 5 xulek

☆ Pêwîst e em civakî bin û bi awayekî komî, bi hevalên xwe re bilîzin.

Lîstika xaçepirsê: 15 xulek

☆ **Şîrovekirin:** Tabloyek li ser depê tê xêzkirin û di nava malikên tabloyê de hin tîp cih digrin. Ew tîp, tîpên gotinên ku li jora tabloyê hatine nivîsandin. Lîstik, bi derketina xwendekarekê/î li ser depê û lêgerîna wê/î li gotinên ku tîpên wan bi awayekî jihevqetandî hatine bicihkirin, dest pê dike. Bi xêzkirina wî ya li ser tîpan û pêkanîna peyvekê, bi dawî dibe.



Çalakiya bidawîkirina waneyê 5 xulek

Wane (5)

RAHÊNANÊN BEJINZIRAVIYÊ

- **Germkirin:** **5 xulek**

Meşa hêdî → Beza hêdî → Beza bilez.

- Tevgerên vezilandinê: **5 xulek**

Berî ku em dest bi tevgerên bejinziraviyê bikin, pêwîst e em hin rahênanên vezilandinê ji bo nermkirina rehên masûlkeyan û pêgirekên gihikan, pêk bînin.

1

2

3

Em li wêneyên li jêr binêrin û mîna wan, tev bigerin. Ev tevger bi alîkariya mamoste û bi awayekî tekane, pêk tên. **30 xulek**

1

2

3

4

Çalakiya bidawîkirina waneyê **5 xulek**

BEŞA ÇAREM


Waneya 1'ê
Rahênanên Tevgerî
Waneya 2'yan
Çalakî
Waneya 3'yan
Hînbûna Lîstikan
Waneya 4'an
Sinc û Sûdên Werzişê
Waneya 5'an
Rahênanên Bejinziraviyê

Wane (1)

RAHÊNANÊN TEVGERÎ

5 xulek

- **Piştî daketina qadê bi awayekî disiplînkirî:**

✺ Rahênanên cotî: 20 xulek

✺ Ka em bi hevaleke/î xwe re vê rahênanê pêk bînin.

☺ Em destên hev bigirin û di cihê xwe de bimeşin.

☺ Em destên hev bigirin û bilind bikin, piştre lingekî xwe bi paş de dirêj bikin û her carekê lingê xwe biguherin.

☺ Bi girtina destên hev em gewdeyê xwe bi kêlekê de, bitewînin.

☺ Em destên xwe li destên hev biçengilînin û li dora hev, bizivirin.

☺ Em destên xwe deynin ser milên hevala/ê xwe û li ser şehê pê, rawestin.

☺ Bi girtina destan re, em gewdeyê xwe bi kêlekan de bikêşin.

✺Lîstik: **15 xulek**

☺ Lîstika avakirina bircê.

Şîrovekirin: Xwendekarên polê li ser du rêzên rastênhev, tên belavkirin. Xêza destpêkê tê nîşankirin. Li pêşiya her rêzekê bingehê siwarkirina perçeyên bircê tê dayîn. Lîstik bi fîkandina mamoste re, dest pê dike. Her xwendekarek, parçeyekî bircê hildigire û li pey hev parçeyên di destê xwe de li ser bingehê bircê, siwar dike.

Çalakiya bidawîkirina waneyê **5 xulek**

Wane (2)

ÇALAKÎ

1- Germkirina bi rêya lîstikê: 10 xulek

♕ Lîstika destlêdanê.

Şîrovekirin: Xwendekar bi awayekî serbixwe li ser lîstikgeheke bisînor, tên belavkirin. Lîstik, di navbera xwendekaran de bi çêkirina pişkê ji bo nîşankirina xwendekara/ê ku li pey hevalên xwe bibeze, dest pê dike. Xwendekar hewl dide destlêdana hevalên xwe bike. Xwendekara/ê tê destlêdankirin, li pey xwendekaran dibeze.

2- Lasakirin: 15 xulek

♛ Em mîna cotkar, tov li baxçeyê belav bikin.

♛ Em mîna masîgir, tev bigerin.

♛ Em mîna bûka nav zeviyê, li ser lingekî rawestin.

♛ Werdek çawa dimeşe, em jî mîna wê bimeşin.

3- Lîstik: 15 xulek

♛ Lîstika tekerê.

Şîrovekirin: Xwendekar li ser du rêzên rastênhev, belav dibin. Bi kovikekê xêza destpêkê tê nîşankirin û bi dûrbûneke guncaw xêza dawî, tê nîşankirin. Lîstik, bi derketina xwendekarekê/î ji her rêzekê, dest pê dike. Xwendekar bi darekî ji text an jî bi bilastîkekê, tekera biçûk ber bi xêza dawiyê ve digindirîne. Piştre ji bo ku bibe dora xwendekara/ê li pey wê/î, vedigere.

((Çalakiya bidawîkirina waneyê)) **5 xulek**

Wane (3)

HÎNBÛNA LÎSTIKAN

Germkirina laş: 5 xulek

Bi armanca amadekirin û germkirina laşê me, pêwîst e em hin rahênanên tevgerî mîna yên di wêneyên li jêr de, pêk bînin.



Lîstika goga zembîlê: 30 xulek

Lîstikeke komî ye û di navbera du tîmên ku bi heman hejmarê ne, tê lîstin. Her tîmek zembîla wê heye. Her tîm hewl dide gogê derbasî zembîla tîma din bike. Gog bi destan tê lîstin (tecandin, derbaskirin).

Em bi hev re goga zembîlê bilîzin.



ê eywandawîkirina biÇalakiya 5 xulek

Wane (4)

SINC Û SÛDÊN WERZIŞÊ

♕ **Germkirina di hundirê polê de:** **5 xulek**

1- Nîvtewandina çokê.
2- Firikandina destan bi hev ve.
3- Dest li jor û dewsîna her du destan bi paş de.

1- Sûdên werzişê: 5 xulek

♕ Werziş, laşê me şeng dike.

2- Tîmarên baş ji werzişvanan re: 5 xulek

♕ Sebze, ji bo werzişvan tîmarên bisûd in.

3- Sincên werzişvan: 5 xulek

♕ Em ji hevalên xwe hez bikin û bi wan re bilîzin.

4- Lîstika rawestandin û rûniştinê: 15 xulek

♛ **Şîrovekirin:** Xwendekar, di mêzeyên xwe de rûdinin. Lîstik, bi bangkirina mamoste bi awayekî bilez ji gotinên **(rûnin, rawestin)** re dest pê dike. Mamoste, ji bo zêdekina baldariya xwendekaran li ser lîstikê, gotinan bi hev diguhere. Pêwîst e xwendekar tevgeran bi bangkirina mamoste re, pêk bînin.

((Çalakiya bidawîkirina waneyê)) **5 xulek**

Wane (5)

RAHÊNANÊN BEJINZIRAVIYÊ

- **Germkirin:** **5 xulek**

Meşa hêdî → Beza hêdî → Beza bilez.

- Tevgerên vezilandinê: **5 xulek**

* Berî ku em dest bi tevgerên bejinziraviyê bikin, pêwîst e em hin rahênanên vezilandinê ji bo nermkirina rehên masûlkeyan û pêgirekên gihikan, pêk bînin.

♛ Em li wêneyên li jêr binêrin û mîna wan tev bigerin. Tevger bi alîkariya mamoste û bi awayekî tekane, pêk tên. **30 xulek**

1

2

3

4

((Çalakiya bidawîkirina waneyê)) **5 xulek**

BEŞA PÊNCEM

Waneya 1'ê
Rahênanên Tevgerî

Waneya 2'yan
Çalakî

Waneya 3'yan
Hînbûna Lîstikan

Waneya 4'an
Sinc û Sûdên Werzişê

Waneya 5'an
Rahênanên Bejinziraviyê

Wane (1)

RAHÊNANÊN TEVGERÎ

5 xulek

- **Piştî daketina qadê bi awayekî disiplînkirî:**

1- Rahênanên hemahengiya sinirî ji masûlkeyan re: 20 xulek

***** Em destekî xwe, berevajî lingekî xwe, bilind bikin.

* Em her du destan bilind bikin; yek ji wan li pêş û yê din jî li kêlekê.

* Em destên xwe bi pêş de bilind bikin û lingekî xwe bi guhertinê bi paş de dirêj bikin.

* Em serê tiliyên xwe bighînin ser milên xwe û bi guhartinê her carê destekî ji wan, bilind bikin.

* Em her car gewdeyê xwe bi kêlekê de bitewênin û pê re destê berevajî hêla tewandî, li jora serî bilind bikin û bitewînin.

2- Lîstik: 15 xulek

* Lîstika avêtina dama sfincî.

Şîrovekirin: Xwendekar li ser du rêzên rastênhev, tên belavkirin. Xêza destpêkê tê nîşankirin **(cihê avêtina dama sfincî)**. Lîstik bi avêtina dama sfincî ji aliyê xwendekara/ê yekem ji her du rêzan ve, dest pê dike. Her rêzek hewl dide dama sfincî ji rêza din dûrtir bavêje. Rêza serkeftî ew e ya ku dama sfincî herî dûr diavêje.

((Çalakiya bidawîkirina waneyê)) 5 xulek

Wane (2)

ÇALAKÎ

1- Germkirin: 5 xulek

✳ Lîstika çirayên trafîkê.

Şîrovekirin: Xwendekar bi awayekî serbest di lîstikgeheke bisînor de, belav dibin. Lîstik bi bangkirina mamoste ji navê rengên çirayên trafîkê **(sor, zer, kesk)** re, dest pê dike. Dema mamoste bi navê rengê sor bang dike, xwendekar radiwestin. Dema bi navê rengê zer bang dike, xwendekar baldar dibin. Dema bi navê rengê kesk bang dike, xwendekar bilez di lîstikgehê de bi aliyên cuda de bêyî ku li hev biqelibin, dimeşin.





2- Lasakirin: 15 xulek

✳ Em weke kîsoyê li ser çarpêkan, bimeşin.

✳ Em weke kengerê çokên xwe bitewînin û xwe bi jor û pêş de, çind bikin.

✳ Em mîna qeyika di nav avê de, tev bigerin û gewdeyê xwe bitewînin.

✳ Em mîna avjen, destên xwe bigerînin.

✳ Em mîna derî li ser lingekî, di cihê xwe de, xwe bizivirînin.



3- Lîstik: 15 xulek

✳ Lîstika gog û zembîlê.

Şîrovekirin: Xwendekar li ser du rêzên beranberî hev, radiwestin. Lîstik bi derketina du xwendekaran ji her du rêzan ku bi hev re gogê datînin ser amûreke nerm (pelik, kîs, perçeyek bilastîk...) dest pê dike. Xwendekar, gogê ber bi zembîlê ve dibin û dema ku gog li ser amûra nerm bimîne her du xwendekar, bi ser dikevin.

((Çalakiya bidawîkirina waneyê)) **5 xulek**

Wane (3)

HÎNBÛNA LÎSTIKAN

1- Germkirina laş: 5 xulek

Bi armanca amadekirin û germkirina laşê me, pêwîst e em hin rahênanên tevgerî yên mîna di wêneyên li jêr de, pêk bînin.

2- Lîstika goga destan: 30 xulek

Lîstikeke komî ye û di navbera du tîmên ku bi heman hijmarê ne, tê lîstin. Her tîmek golekî wan heye. Gog bi destan tê lîstin (**tecandin û derbaskirin**). Her tîmek hewl dide gogê bixe gola tîma din.

Em bi hev re goga destan bilîzin.



((Çalakiya bidawîkirina waneyê)) 5 xulek

Wane (4)

SINC Û SÛDÊN WERZIŞÊ

✯ **Germkirina di hundirê polê de:** **5 xulek**

1- Vekirin û girtina tiliyan.

2- Hevbirîna destan li jor.

3- Rawestandina li ser şehê pê.

1- Sûdên werzişê: 5 xulek

✯ Werziş şengiya laşê me, xwezeyî dihêle.

2- Tîmarên baş ji werzişvanan re   5 xulek

★ Ji ber ku mêwe vîtamînan didin laşê werzişvan, ew tîmarên bisûd in.

3- Sincên werzişvan: 5 xulek

★ Werzişvan bi hevalên xwe re dilîze û rêzgirtinê ji destûrên lîstikan re, digire.

4- Lîstika şev û rojê: 15 xulek

✯ **Şîrovekirin:** Xwendekar, di mêzeyên xwe de rûdinin. Lîstik bi bangkirina mamoste ji gotinên **şev an rojê** re bi awayekî bilez, dest pê dike. Di dema bangkirina gotina **şevê** de, xwendekar serê xwe datînin ser mêzeyê, lê di dema bangkirina gotina **rojê** de xwendekar serên xwe ji ser mêzeyê radikin. Mamoste her carê gotinan bi hev diguhere bi armanca xurtkirina bertekên tevgerî li cem xwendekaran.

((Çalakiya bidawîkirina waneyê)) **5 xulek**

Wane (5)

RAHÊNANÊN BEJINZIRAVIYÊ

- Germkirin: **5 xulek**

Meşa hêdî → Beza hêdî → Beza bilez.

- Tevgerên vezilandinê: **5 xulek**

* Berî ku em dest bi tevgerên bejinziraviyê bikin, pêwîst e em hin rahênanên vezilandinê ji bo nermkirina rehên masûlkeyan û pêgirekên gihikan, pêk bînin.

★ Em li wêneyên li jêr binêrin û mîna wan tev bigerin. Tevger bi alîkariya mamoste û bi awayekî tekane, pêk tên. **30 xulek**

1

2

3



4

((Çalakiya bidawîkirina waneyê)) **5 xulek**

Belavkirina Waneyan Li **Ser Sala Xwendinê**

Meh \ Heftî	Heftiya Yekem	Heftiya Duyem	Heftiya Sêyem	Heftiya Çarem
Rezber			Rahênanên Tevgerî	Çalakî
Cotmeh	Hînbûna Lîstikan	Sinc û Sûdên Werzişê	Rahênanên Bejinziraviyê	Rahênanên Tevgerî
Mijdar	Çalakî	Hînbûna Lîstikan	Sinc û Sûdên Werzişê	Rahênanên Bejinziraviyê
Berfanbar	Rahênanên Tevgerî	Çalakî	Hînbûna Lîstikan	Sinc û Sûdên Werzişê
Rêbendan	Di Navbera Xwendekaran de Çêkirina Pêşbirkan	Lêveger	BÊHINVEDAN	BÊHINVEDAN
Reşemeh	Rahênanên Bejinziraviyê	Rahênanên Tevgerî	Çalakî	Hînbûna Lîstikan
Avdar	Sinc û Sûdên Werzişê	Rahênanên Bejinziraviyê	Rahênanên Tevgerî	Çalakî
Cotan	Hînbûna Lîstikan	Sinc û Sûdên Werzişê	Rahênanên Bejinziraviyê	Di Navbera Xwendekaran de Çêkirina Pêşbirkan
Gulan	Lêveger	NIRXANDIN		